

Dumahîk : Ji Kurdan re....

mirovêkî pîr î îxtiyar, heştê salî, pê hevsarê kerê girtiye û dimeşe, li pey kawran nehdeh xortên ciwan dimeşin tên. Elî wexta ku nêzî kawran dibe, ji mirovê kal re:

- Selam û eleykum ya pîr î îxtiyar dibêje, îcar pîrê

Kal:

Eleykumselam ya Elî dibêje. Ji ber ku wî bi şûrê wî yê du çetel, nav Zulfîqar ve nas dike. Li pey silav dayîn û ragirtina silavê, îcar Elî:

- Ya pîr î îxtiyar temenê te, ango salê te çend in? pirs dike, îcar îxtiyar:

- Ya Elî salên min çil, ez çil saliyê de me.

- Êh, va hêştirana ê kê ne? îcar îxtiyar:

- Tenê hêştirek min di nav van de ye dibêje, îcar Elî:

- Va xortana kurê kê ne? dibêje, îcar îxtiyar:

- Ya Elî di nav van de, tenê kurekî min heye dibêje, îcar Elî şûrê xwe dikşîne ku serê kalo jêke, kalê îxtiyar yekser bi qêrîn:

- Tu dixwazî çi bikî ya Elî ? îcar Elî bi hêrs:

- Fermana Peyxamber e. Her kî ku sê derewan li ser hev bike, divê ez serê wî jêkim bifirinîm. Te bi xwe jî sê derew li ser hev kir got, îcar îxtiyar:

- Sê derewên çî?

- Kuro salên te heştê ye, te got “Ez çil salî da me” hêştir giş ên te ne, te got “Tenê hêştirek min di nav de ye. Hemû kurên te ne, te got “Tenê kurekî min di nav van da ye” got bi hêrs, îcar pîrê kal:

- Rast e ya Elî, ez kalekî heştê salî me, lê çil salên xortaniya min di nav nezanîyê de derbas bû, ez piştî çil salî bi xwe hesiyam û min xwe nas kir. Ji ber vê yekê ye ku ez dibêjim ez di çil salî de me got, îcar Elî:

- Berat, lê va hêştirana ên kê ne? vêca dîsa îxtiyar:

- Ya Elî evana giş hêştirên min in, lê vana

malê vê cîhanê ne, çu hêjayiyek malê vê cîhanê tune. Eger ku bi rastî axiret, cîhanek dî heye, di nav van hêştiran da min hêştirek nêzî kiriye qurban, bibe ku ev qurbana li axiretê, di wê cîhana rast de bikeve ber gunhekî min. Ji ber vê yekê ye ku ez dibêjim “ - Êh berat, lê va xortana kurê kê ne? Îcar îxtiyar:

- Ya Elî vana giş kurê min in, lê hemû bê xêr in, bê ol û îman in, tenê kurê min ê biçûk lawikekî dilsoz, xudan bîr û bawerî, ji dê û bavê xwe re jî rêzdar e. Ji ber vê yekê ye, ku ez dibêjim “Tenê kurekî min heye” dibêje, Elî jî:

- Ê baş ya pîr î îxtiyar berat dibêje û xatir dixwaze, ji kalo dûrdikeve, gelş li vir dûwayî dibîne.

Xwendevanên hêja çira min ev çîroka nivîsî? Ji bo me Kurdan. Çito ku kalo ji Elî re “Ez piştî çil salî bi xwe hesiyam” got, divê em jî piştî evqas şaşî û çewtiyan bi xwe bihesin, dost û dijminên xwe nas bikin, ji hev re rêzdar bin, pîrengî û pirdengiyê bipejirînin. Divê em hevdu hezbikin, geznekin û nêşînin, daku em serkevin, wek hemû gelên azad û xwedan dewlet, em jî bibin xwedan dewlet û dezgeh.

Keçeke Vêtnamî di çend rojan de pîr bû

Rojnameya Toi Try ya Vêtnamî ku yek ji mezintirîn rojnameyan e

ku li Vêtnamê derdikeve,

diyar dike ku , keça

ya bi navê Nujween Taiin

Fong , di sala 2008 de

xwarineke deryayî xwar,

piştî çend setan, dema ku

di neynikê de li xwe

kir, dît ku rûyê wê qermiçî ye, di nava çend

rojan bû pîreke 3 caran ji temenê xwe

mezintir .

Ev nûçe jimalpera Avesta Kurd hatiye girtin

